

Penaxwaz: Dikarî kar bikî tenê eger mafê te yê karkirinê hebe



Gava ku karekî peyda bikî, divê piştrast bibî ku mafê te yê karkirinê dest pê kiriye û hê jî berdewam e.

Divê ku yekser piştî bidawîhatina mafê xwe yê karkirinê ji xwedîkarê xwe re bibêjî. Dibe ku tu bibî sûcdar eger tu bêyî mafê karkirinê kar bikî.

Mafê karkirinê kengî dest pê dike?

Dikarî karekî bimeaş yan xebateke din ya bipare bi vî awayî bikî:

- Dikarî piştî sê mehan ji dema dawakirina penaberiyê dest bi kar bikî eger te pasport yan belgenameyeke din ya seferkirinê ya hebe ku dema wê mabe û wek resen li ba dewletê hatibe pesendkirin.
- Dikarî piştî şeş mehan ji dema dawakirina penaberiyê dest bi kar bikî eger te ti pasport yan belgenameyeke din ya seferkirinê tine be.

Dikarî heta kengî karkirinê bidomîn?

Gava ku biryarekê li ser dawakirina xwe ya penaberiyê wergirî, lê binêre ka mafê te yê karkirinê hê jî berdewam e yan na.

Eger biryareke erênî wergirî

- Di piraniya haletan de dikarî karkirina xwe li Finlandayê bidomîn.
- Ji karta îqameyê yan biryarê lê binêre ka dikarî li Finlandayê kar bikî.

Eger biryareke neyînî wergirî

- Mafê te yê karkirinê bi dawî dibe gava ku biryara te bo bicihanînê bikêrhatî be.
- Di biryarê te tê gotin ka biryar kengî dikare were bicihanîn.
- Zêdetir li ser malpera Daîreya Koçberan bixwîne:
migr.fi/kaannyttaminen

Derbarê mafê karkirina penaxwazan li ser malpera Daîreya Koçberan bixwîne:
migr.fi/turvapaikanhakijan-tyonteko-oikeus

Dawakirina nû çî tesîrê li mafê karkirinê dike?

Eger te dawakirina xwe nû kiribe, dikarî bi vî awayî bikî:

- Dikarî piştî sê mehan ji dema dawakirina penaberiyê dest bi kar bikî eger te pasport yan belgenameyêke din ya seferkirinê ya hebe ku dema wê mabe û wek resen li ba dewletê hatibe pesendkirin.
- Dikarî piştî şeş mehan ji dema dawakirina penaberiyê dest bi kar bikî eger te ti pasport yan belgenameyêke din ya seferkirinê tine be.

Dawakirina nû tê wateya dawakirina penaberiyê ya ku penaxwaz dikare bike piştî wergirtina biryareke nîhaî li ser dawakirina xwe ya pêşîr. Biryar dibe nîhaî gava ku mirov nikaribe êdî itiraz li wê bike.

Erkê xwedîkar e ji mafê karkirinê piştrast bibe

Xwedîkar divê piştrast bibe ji wê yekê ku te îqameya karkirinê heye yan jî ne hewceyî îqameyê yî.

Xwedîkar dibe ku bibe sûcdarê tawanê eger ew bi qest yan ji terkexemiyê kar bi te bide kirin eger te mafê karkirinê tine be.

Li gor qanûnê tu ne hewceyî belgenameya mafê karkirinê yî

Mafê te yê karkirinê li ser bingehê qanûna biyaniyan e. Dikarî derbarê mafê karkirina xwe yan ya karkerên xwe belaş bi emailê bipirsî: migri.fi/todistus-tyonteko-oikeudesta.

Di biryara Daîreya Koçberan de hatiye gotin ku kengî biryar dikare were bicihanîn. Polîs ji bicihanîna biryarê berpirsiyar e. Karbidestên parastina ewlehiya kar çavdêriya erkê erkê piştrastbûna xwedîkar ji mafê karkirinê dikin: tyosuojelu.fi/tyosuhde/ulkomainen-tyontekija/tyonteko-oikeus. Di van mijaran de xwedîkarê te dikare têkiliyê li gel karbidestên berpirsiyar bike.